
Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1082 | 16-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

# Nivîsên Mehmet Hayrî Dûrmûş bûn pirtûk

**Nivîs û nameyên yek ji kadroyên pêşeng û damezrênerên PKK'ê Mehmet Hayrî Dûrmûş ên ku li Zindana Amedê nivîsîne, ji aliyê Weşanên Serxwebûnê ve hatin çapkirin.**

Mehmet Hayrî Dûrmûş ku gotibû 'Di nava doza PKK'ê de ez dilopek jî nîn im' li hevrêyên xwe kiribû wasiyet ku li ser kevirê gora wî gotina 'Bi deyndarî mir' binivîsînin, di sala 1955'an de li Çewlîgê ji dayik bû. Li Fakûlteya Tibê ya Hacettepeyê ya Enqereyê dema ku di pola sêyemîn de bû, dibistan terikand. Di sala 1973'yan de tev li nava Tevgera Azadiyê bû, cihê xwe di Kongreya Damezirandinê ya PKK'ê de girt û bû endamê Komîteya Navendî.




Di sala 1979'an de piştî ku li Qoserê hate destgîrkirin li Dadgeha Rewşa Awarte ya Amedê wek endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê parastina siyasî kir. Ji bo dawî li zext û îşkenceya li girtîgehê bê anîn, ji bo mafê parastina siyasî bê dayîn, di 14'ê Tîrmeha 1982'yan de tevî 9 hevalên xwe Berxwedana Rojiya Mirinê bi rêxistin kir.

Di Berxwedana Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê de Kemal Pîr 7'ê Îlonê, Mehmet Hayrî Dûrmûş 12'ê Îlonê, Akîf Yilmaz 15'ê Îlonê, Alî Çîçek jî 17'ê Îlonê şehîd bûn.

### Nameya Hayrî Dûrmûş

Piştî 41 salan name, nivîs, raporên Mehmet Hayrî Dûrmûş ên li dadgehê hatin komkirin û ji aliyê Weşanên Serxwebûnê ve bi zimanê tirkî wek pirtûk hatin çapkirin.

Nameyeke Mehmet Hayrî Dûrmûş a ku beriya niha nehatibû weşandin jî di hejmara dawîn a rojnameya Serxwebûnê de hate weşandin.

Nameya Mehmet Hayrî Dûrmûş a ku 25'ê Mijdara 1980'yî de nivîsiye, wiha ye: "Mîna li her devera cîhanê, wek kesekî ku haya xwe ji wezîfe û berpirsyariyên xwe heye, ez jî ji bo rizgariya gelê xwe, ji bo serxwebûna welatê xwe tev li têkoşînê bûm. Ji sala 1973'an heta 1979'an bi rengekî çalak xebitîm. Di 30'ê Mijdara 1979'an de di encama operasyoneke polîs û artêşa Tirk de dîl hatim girtin. Niha tevî bi sedan hevrêyên xwe, bi sedan mirovên demokrat û welatparêz li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê tême girtin. 7 salan bi rengekî çalak têkoşiyam. Ev dem dibe ku ji bo we gelekî dirêj be, lê belê ji bo mirovekî siyasetmedar ê ku her tiştê xwe daye şoreşê, demeke gelekî kurt e. Hîn di roja destpêkê ya têkoşînê de min baş zanîbû ku rizgariya welat û gelan bi çend mehan, bi çend salan pêk nayê. Her wiha di nava têkoşînê de baş hîn bûm ku rizgariya welatekî mîna Kurdistanê, aramiya gelê me karê gelek nifşan e. Lewma mîna hevrêyên xwe hemûyan, daxwaza min a têkoşînê gelekî zêde ye. Min dixwest hîn salên dûr û dirêj bi rengekî çalak têbikoşim, lê belê hatim girtin û dîl ketim dest. Ji têkoşîna çalak bêpar hatim hiştin. Ev yek min diêşîne, lê belê her ku dibînim gelê min, hevalên min di binê lingên mîlîtarîzma Tirk de têne eciqandin, di bin zext û îşkenceyê de bi namerdî têne qetilkirin, hêrsa min qat bi qat zêde dibe. Bawerî û dilsoziya min a bi şoreşê re xurtir dibe. Ez ê bi hemû bawerî û daxwaza xwe têkoşîna xwe dewam bikim. Li zindanê jî bim ez ê ji berjewendiyên gelê xwe û hevrêyên xwe dûr nekevim. Di nava heft salên derbasbûyî de min huner û tecrûbeya xwe ji bo gelê xwe bi kar anî û bi vî rengî xebitîm.

Tevî hevrêyên xwe li Kurdistanê geriyam û min pirsgirêkên rastî yên gelê me û welatê me rast fêhm kir. Min hewl da ku rastiyan hînî ciwan, rewşenbîr û girseyên gel ên welatê me bikim. Heta ku ji min hat, min qalê kir bê çima cahil hatine hiştin, perîşan kirine, komkujî têne kirin, çavkaniyên me yên dewlemend têne talankirin, zext û zordarî li ziman û çanda me tê kirin, gelê me tê bênasnamekirin, mirov bê nan û bê av hatine perîşankirin û li Stenbol, Edene, Hatay û deverên din mîna koleyan têne xebitandin. Min hewl da ji gelê xwe re vebêjim ku berpirsyarê van nebaşiyan hemûyan mêtingerên Tirk û xayinên Kurd ên xulamên wan in.

Belê me windahiyên giran dan. Hîn jî em didin. Lê belê ne artêşa Tirk, ne xayinên wan ne jî mezinên wan emperyalîst wê nikaribin PKK'ê biqedînin, wê nikaribin ruhê berxwedanê yê gelê me têk bibin, têkoşîna azadî û serxwebûnê wê bi pêşengtiya PKK'ê teqez bi ser bikeve. Mîna gelek hevrêyên xwe ez jî li zindanên mêtingeriyê, li dadgehên wan dilsozê doza bilind a gelê xwe û PKK'ê mam, bi pîvanên wê ve girêdayî bûm û ez ê vê helwesta xwe dewam bikim."

# Albert û Vîrcînya ji plastîkan hûnerên dest çêdikin û jîngehê diparêzin

**Du hevserên xiristiyan li navçeya Diyana ya Hewlêrê, rojane bîdon û paşmayên plastîk kom dikin û li malê bi dehan cûrên kelûpelên ciwan û hunerî jê çêdikirin. Herdu hevser dibêjin armanca wan ya serekî ji vî karî, parastina jîngeha navçeyê ye ku ji aliyê welatiyan ve tê qirêjkirin.**



Albert Cibraîl Silêwe welatiyek Aşûriye ku bawermendê ola Xiristiyaniyê ye û pîşeyê wî mamostetî ye, rojane bi hevsera xwe re li kolan û kuçeyên navçeya Diyana ya Îdareya Serbixwe ya Soran ya girêdayî parêzgeha Hewlêrê, qepaxên bîdonan, paşmayên plastîk kom dikin û vedigerînin tiştên bedew, rengîn û hûnerî.

Albert Cibraîl û hevjîna xwe Vîrcînya Adonya di vî karî de, li rex çêkirina kelûpelên hûnerî û rengîn armanca wan yek jî jê parastina jîngehê ku bi plastîkên ji nav kolanên navçeyê kom dikin û bi vî awayî jîngehê jî paqij dikin û ji gemarê diparêzin. Ew dihizirin ku jîngeh a her kesê ye û divê bi hev re biparêzin. Ji bo vê jî dirûşmeyek a wan heye dibêjin "Hilgire, ne avêje."

Mamoste Albert Cibraîl di derbarê karê xwe û paqijkirina jîngehê de ji Rojnews'ê re axivî û got; "Tenê ji ber dûyê Bexda û Besra jî jîngeha vê derê û befra serê çiyayên Hindirîn û Zozik jî qirêj dibe. Lewra sînorê jîngehê tuneye û divê her kes li beramberî parastin û paqijgirtina jîngehê bi hestekî berpirsyar tevbigere. Min heta niha zêdetirî 5 hezar parçeyên plastîk û qebaxên bîdonan kom kirine. Xewna min jîngehparêziye. Ez dixwazim jîngeh tim pak û xweşik be. Ji ber ku jîngeha bi tenduris, kesê bi tendurist û civaka bi tendurist ava dike. Lê welatiyên li vê derê dijîn, hej berpirsyartiyê nakin û girîngiyê nadin parastina jîngehê. Ez gelek kesan dibînim ku jîngehê qirêj û gemar dikin. Lê ez tenê jî bim û kes alîkariya min neke jî, ezê bi berdewamî jîngehê paqij bikim û biparêzim."

Herwiha Vîrcînya Edonya Kako, hevjîna mamoste Albert, tevî ku bi hevserê xwe re jîngehê paqij dike û plastîkan ji nava navçeyê kom dike jî, li malê jî li gel hevserê xwe bi awayek din sûd ji parçeyên plastîk, bîdon û qebaxên wan dibîne, bi dehan pêdiviyên nav malê û yên xemilandinê çêdike.

Vîrcînya wiha dibêje; "Em bîdonan dixin nav wesayîta gilêjî û bi rêya tîmên şaredariyê wan diavêjin. Lê em qebaxên wan navêjin. Ji ber ji bo pêdiviyên karê xemlê û xweşiktiyê bikar tînîn. Armanca me ya sereke ji vî karî parastina jîngehê ye."

Vîrcînya dibêje ew ji qebaxên bîdonan,sermez,ser dolab,berikên ber derî û guldankan çêdikin herwiha bi dehan tiştên din jî ji wan çêdikin û got; "Ez dixwazim hemû jin vî karî bikin û xwe fêr bikin. Ji ber ku bi vî karî dikarin nava mala xwe bedew, xweşik û balkêş bikin, hem jî jîngehê biparêzin. Li şûna ku ew biçin nav bazarê wan pêdiviyên nava malê bikirin, dikarin bi destê xwe çêbikin."

Sudoku: Bersiv 91

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 4 | 1 | 7 | 3 | 8 | 5 | 6 | 9 |
| 9 | 6 | 8 | 4 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 |
| 3 | 5 | 7 | 2 | 9 | 6 | 1 | 8 | 4 |
| 7 | 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 4 | 9 | 6 |
| 6 | 9 | 5 | 8 | 4 | 2 | 7 | 3 | 1 |
| 4 | 1 | 3 | 9 | 6 | 7 | 8 | 5 | 2 |
| 8 | 7 | 4 | 6 | 2 | 9 | 3 | 1 | 5 |
| 1 | 2 | 6 | 3 | 7 | 5 | 9 | 4 | 8 |
| 5 | 3 | 9 | 1 | 8 | 4 | 6 | 2 | 7 |

Sudoku:Pirs 92

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 8 | 7 | | | | |
| 7 | | 6 | | 5 | | | | |
| | 1 | | 2 | | | | | 6 |
| | | 1 | 5 | 4 | | 2 | 9 | |
| 2 | | 4 | | 6 | | 1 | | 5 |
| | 9 | 5 | | 2 | 7 | 3 | | |
| 3 | | | | | 2 | | 1 | |
| | | | | 1 | | 6 | | 8 |
| | | | | 9 | 3 | | | |

## Quncika Têgînan

| Hêman | Bingeh, hîm, xîm, esas. Bernameya xwe li ser hêmaneke xurt çêkiriye. |
|---|---|
| Koalisyon (Fransî) | Yekîtiya ji çend hêzan pêk tê, rêveberiya hevbeş: Welat bi koalisyonê tê birêvebirin. Itîlaf. |
| Restore (Fransî) | Çêkirina deverên xerabûyî yên avayiyekê, Nûkirin: Keleha Elodîno hat restorekirin. |
| Rêgez. | Fikirê bingehî, baweriya bingehî. Prensîb, mebde: Rêxistineke xwedîrêgez e. Mirovekî xwedîrêgez e. |
| Stad/Stadyom (Fransî) | Ciyê lîstina taximan, ciyê pêşbirka lîstikên sporê, ciyê merasiman. Qad, sahe: Du taximên futbolê li stadyoma Qamişlo hatin hemberî hev. |
| Tîm (Ingilîzî) | Yekîneyeke futbolê û lîstikên din. Du tîmên futbolê hatin hemberî hev. Ferîq. |
| Turnuva (Fransî) | Rêzepêşbirkên bi dorê di navbera tîmên sporê de tên lidarxistin. Mûsabeqe. |
| Tûnel (Fransî) | Riya di bin erdê de, riya hawîrdorê wê girtî. Ji bo kurtkirina rê di çiyê de tûnelek hat vekirin. |
| Werziş | Spor. |
| Werzişvan | Kesê sporê dike. |




## Encamnameya komxebatê baweriya bi têkbirina Lozanê ye

Endama Kordînasyona Kongra Star a Rojava Şîraz Hemo destnîşan kir ku encamnameya Komxebata Jinan a Peymana Lozanê, ji bo tevahî jinan e û ji bo têkbirina encamên peymana Lozanê baweriyeke bingehîn e. Her wiha diyar kir ku ew dê xalên encamnameyê bi jinan re nîqaş bikin.**R-2**

Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1082 | 16-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ŞOREŞA19`Ê TÎRMEHÊ ŞOREŞA AZADIYA JIN Û CIVAKÊ YE

Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji encama dayîna berdêlên binirx, gelek destkeftiyên giranbuha bi xwe re anîn û sîstema Hevserokatiyê jî yek ji van destkeftiyan e. Xerîb Hiso da tekezkirin ku jinê muhra xwe di pêşveçûna şoreşê de xist û xwe isbat kir.**R-4**



## 'Jin jiyan azadî' û şoreşa jinê



Di Rojhilata navîn de çandeke berxwedana jinê ya hezarê salan heye ku xwe dispêre rastiya civakî û dîrokî ya vê heremê. Di nava vê rastiyê de em her tim rola jinê û tekoşîna wan dibînin û di her welat û her herêmê de şopên wê tê dîtin. Raste gelek caran ew cografya bi şerên germ, desthilatdarî û dagirkerî tê nasîn lê di kêleka wê jî şahidiya dîrokî ji bo civakbûnê jî dike. **R-6**

## Lozan qirkirina sedsalê ye



Bi Peymana Lozanê ya ku sedsal berê pêk hat, di 24'ê Tîrmeha 1923'an de gelê Kurd ji aliyê pergala cîhanê ya hegemonîk ve nehat naskirin û hate tunekirin. Ji Lozanê heta niha li ser gelê Kurd polîtîkaya îmha û qirkirinê tê meşandin.**R-5**

## Komîna Fîlm a Rojava mîrasa Yilmaz Gûney ye

Komîna Fîlm a Rojava bû tovika yekemîn a sînameya kurdî piştî Şoreşa Rojava, Endama Komîna Fîlm a Rojava Nadiya Derwîş diyar kir ku wan di warê sînemayê de gavên mezin avêtin e û got, Komîna Fîlm a Rojava dengê gelên herêmê bi rêya sînameyê dighîn e cîhanê.R-7




Li NATO'yê Tiyatroya Tirkiyê
Ahmed Aktaş R-4

Çiqas nakok bin, bi hêzên demokrasiyê re li hev nakin
Idrîs Henan R-5

# ‘Pênûs û helbest bûn rêhevalên jiyana min’

Helbestvana kurd a Rojavayê Kurdistanê Şama Mihemed ji zaroktiya xwe ve ji nivîsandina helbestê hez kir û helbest bû rêhvala jiyan wê, bi vîna xwe tevahiya astengiyan derbas kir û bû yek ji stêrkên helbestê li Rojavayê Kurdistanê.

**Hemze Sêvo/Qamişlo**



Şama Mihemed ji jinên nivîskar û helbestvana kurd ya Rojavayê Kurdistanê ye. Di 21’ê Tîrmeha 1970’î de, li bajarê Qamişlo hatiye dunyayê, xwendina seretayî û navîn li bajêr xwendiye. Piştî xwendina xwe ya navîn diqedîne û bi malbata xwe re diçe Şamê. Herwiha li Şamê jî ji ber hin sedemanên malbatî xwendina xwe ya amadeyî nabe serî û dev ji xwendê berdide. Piştî destpêkirina kirîza Sûriyeyê û Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, Şama bi malbata xwe re vedigerin Qamişlo. Piştî 40saliya xwe , ew ji ber hezkirina ji fêrbûna zimanê kurdî re, 3 astên zimanê Kurdî di sala 2013`an de bi dawî dike. Êdî di dibistanên Qamişlo de dibe mamosteya zimanê Kurdî. Wê bawernameya peymangeha Cegerxwîn a Zanistên Perwerdehiyê di sala 2015`an de werdigire. Di heman demê de jî Şama tevlî xebatên Saziya Zimanê Kurdî de kar dike. Di 2020’an de, Zanîngeha Rojava derfeta xwendina vekrî dide wê û 50 mamosteyên din ku Beşa Wêjeya Kurdî bixwînin. Ew bi vîneke xurt dest bi xwendina xwe ya zanîngehê dike û bi pileyeke serkeftî ji Zanîngeha bi hevalên xwe re derdiçe. Piştî wê jî bi riya Zanîgeha Rojava tevlî koma xwendinê ya bi navê Kurdilojî dibe û tê de jî bi ser dikeve. Semîner bi riya bernameya Zûmê ji aliyê Nivîskar Ibrahîm Seydo Aydogan ve dihatin dayîn, herwiha 100 nivîskar û rewşenbîr li ser asta Kurdistanê di van semîneran de amade dibûn.

Şama Mihemed di peymangeha Amadekirina mamosteyan hevseroka Beşa Wêjeya Kurdî ye û hem di peymangehê de karê mamostetiyê dike. Hêjayî gotinê ye ku Şama Mihemed hezkera nivîsîna helbesta kurdî ku zêdetirî 50 helbestên wê hene. Di gel vê yekê jî, çîrok û kurteçîrokan jî dinvîsîne ku heya niha encama xebatên wê, gihaye nêzî 40 çîrok û kurteçîrokan.

Şehadeta kurê wê êşeke mezin li cem ava kir û berê wê bi awayekî xurt da ber bi nivîsandina helbestê, ku ew hestên xwe û yên dayikên kezebşewitî bîne ser ziman.

Derbarê hezkirina helbestê, berhem û xabata helbestvanan jin Şama Mihemed, ew ji rojnameya me re axivî.

**’Ji zaroktiya xwe ve min ji helbestê hez kir’**

Şama derbarê destpêkirina nivîsandina helbestê û hezkirina wê jê re wiha got: “Min ji zarokatiya xwe ve ji nivîsandin û xwendina helbesta erebî hez kir. Pênûs rêhevala jiyana min bû. Pirî caran nivîsîna hevokên kurt û watedar mijara pênûsa min bû. Herwiha min destpêkê tenê bi zimanê erbî dinvîsand. Ev yek heya destpêkirina Şoreşa Rojava berdewam kir. Min gelekî ji xwendin, nivîsandin û fêrbûna zimanê kurdî hez dikir. Lewma dema derfet çêbû û ez vegeriyam Rojava min jî bi destpêkirina şoreşê re xwe fêrî zimanê kurdî kir. Herwiha xwe tê de pêş xist, vê yekê hişt ku hewldanên min ji bo nivîsîna helbestê û derbirîna hestên xwe bi zimanê dayikê pirrtir bibe. Min êdî bi awayekî herkbar û xweş hestên hûnandin û kirin helbest. Mijarên helbestên min, pirî xwe li ser civak, jin, şehîd, Şoreşa Rojava, zimanê kurdî û hwd…in. Di warê nîvîsîna helbestê de jî kar û xebata min didome û di heman demê de jî dîwana min ya helbestê jî li ber çapê ye.”

**’Şehadeta kurê min bandoreke mezin li min kir ’**

Şama da zanîn ku piştî şehadeta kurê wê, ew zêdetir bi nivîsandina helbestên ku tê de hestên xwe derdixe, hat girêdan û wiha li axaftina xwe zêde kir: “Piştî ku kurê min Şadî di ber axa welatê xwe de gihaşt asta şehadetê, êdî hestên min gur bûn. Ez gelekî xemgîn mam. Şehadeta kurê min gelekî bandor li min û hestên min kirin. Ji bo ku ez vê êşê bînim ziman, normalde min zêdetir berê xwe dida nivîsîndina helbestê. Min li ser kurê xwe helbestek bi navê Helbesta Evînê honand û malika yekê kir “ Berxê min jiyana te hevokeke kurt bû” min helbesta xwe wiha da destpêkirin, ji ber ku Şadiyê min hîn di destpêka ciwaniya xwe de bû. Min gelek caran ev helbest li deverên cuda xwendiye û her kesê ku li vê helbestê guhdarî kiriye bi wê ve hatiye girêdan û bibandor bûye. Ev helbesta ne tenê ji bo derbirîna hestên min e, lê diyarî ji bo hemû dayikên şehîdan e. Hemû dayikên şehîdan dikarin şehîdên xwe bi vê helbestê re binere û biaxive.”

**’Min Bi vîna xwe tevahiya astengiyan derbas kir’**

Şama balkişand ser zehmetiyên ku derketin pêşberî wê û wiha got: “Despêkê ez ji aliyê civakê ve hatim rexnekirin, yek ji sedeman ew bû, ku weke wan digot temenê Şama yê mezin ji fêrbûnê re ne guncav e, ya din jî ji ber ku ez jin im û li gor civakê xebata jinê nedihat qebûlkirin. Vê yekê gelekî nedomand. Ji ber ku min bi vîna xwe xwe fêrî ziman, çand û wêjeya xwe kir. Di heman demê de min guh neda tu kesî ti astengî rê li pêşiya xwesteka min negirt. Lê belê min di warê nivîsîna helbest û çîrok û kurteçîrokê de jî, xwe pêş xist. Ji Zanîngeha Rojava jî derçûm. Herwiha Navenda jinê Utamara li Elmanya pirtûkek bi navê “Her jin çîrokek xwe heye” çap kir û min di vê pirtûkê de helbesta xwe ya bi navê “Lorî” beşdar kir. Herwiha di gelek şevbuhêrk û çalakiyên rewşenbîran de beşdar dibim, min di gelek kovaran de helbest û çîrok û mijarên wêjeyî weşandine, weke: Şermola, Sîwan, Kovara Avşîn, Destar, Dezgeha Welat û di hin malperên internêtê de, û di Rojnameya Ronahî de jî weşandiye.”

# Encamnameya komxebatê baweriya bi têkbirina Lozanê ye

**Endama Kordînasyona Kongra Star a Rojava Şîraz Hemo destnîşan kir ku encamnameya Komxebata Jinan a Peymana Lozanê, ji bo tevahî jinan e û ji bo têkbirina encamên peymana Lozanê baweriyeke bingehîn e. Her wiha diyar kir ku ew dê xalên encamnameyê bi jinan re nîqaş bikin.**

Duh komxebata jinan a têkildarî komkujiyên li Mezopotamyayê û bandorên wan li ser jinan bi dirûşma “Bi hêz û hevgirtina jinan em dê siyaseta parçekirinê û qirkirina gelan a Lozanê têk bibin” û bi beşdariya zêdetirî 60 nûnerên siyasî ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li dar ket û bi encamnameyekê bi dawî bû.

Ji xalên sereke yên encamnameya komxebatê, avakirina lêvegereke jinan û pêkanîna konfederaliya jinan li ser asta Rojhilata Navîn, parastina destkeftiyên jinan ji bo ku li hember siyasetên li dijî jinan bisekinin, eniya hudirîn a jinan li ser tevahî astan, parastin û mekanîzmaya parastinê xurtir bikin û li hember tevahî siyasetên li dijî herêmê bisekinin.

Piştî komxebatê, endama Kordînasyona Kongra Star a Rojava Şîraz Hemo, encamnameyên komxebatê û rêbazên pêkanîna wê nirxandin.

Şîraz bal kişand ser beşdariya jinan di komxebatê de û sedemên hilbijartina mijara komxebatê ku Peymana Lozanê bû û got: “Gelek jin tev li komxebatê bûn. Gelek jî bi rêya Zoomê tev lê bûn, bi nêrîn û nirxandinên xwe komxebat dewlemend kirin. Me girîngî da rewşa jinan li gel Peymana Lozanê, qirkirinên li dijî wê pêk hatine. Ji bo wê diviyabû ku rêbazên sekna



li dijî siyasetên parçekirinê yên ku hêzên hegemon li herêmên me kirine, werin nîqaşkirin. Parçekirina ku di encama peymanê de pêk hatiye, serî pêşîn li dijî civak û jinan bû. Di radeya yekemîn de jin bi van siyasetan re rû bi rû ma.” Şîraz diyar kir ku beşdaran di nirxandinên xwe de teqezî bi sekna li hember siyasetên parçekirinê kirin ku di pergala netewa demokratîk û yekitiya pêkhateyan de nixumandî ye û got: “Her wiha di yekitiya kurdî de jî veşartî ye ji ber ku di encama Peymana Lozanê de Kurd hatin parçekirin.”

Şîraz Hemo wiha pê de çû: “Ji lew re diviyabû dîrok baş were xwendin û analîzkirin, ders jê bên girtin û têkoşîn were mezinkirin. Bi faktorên ku jinan bi dest xistine, bi xurtkirina pergala xwe ya parastinê, em dê li hember van siyasetan bisekinin û Peymana Lozanê têk bibin.”

Têkildarî rêbazên praktîkkirina encamnameyê jî Şîraz wiha axivî: “Bi zendên tevahî rêxistinên jinan ên herêmê em dê, van xalên encamnameyê bi rêya xurtkirina têkiliyan û diyalogê bi jinan re, ragihînin tevahî jinan li herêmê û derveyî wê. Armanca me, avakirina eniyeke xurt a jinan e da ku planên vê peymanê têk bibin. Tevahî xalên encamnameyê, yên jinên tevahî herêmên Rojhilata Navîn in.”



# Komîna Fîlm a Rojava mîrasa Yilmaz Gûney ye

Komîna Fîlm a Rojava bû tovika yekemîn a sînameya kurdî piştî Şoreşa Rojava, Endama Komîna Fîlm a Rojava Nadiya Derwîş diyar kir ku wan di warê sînemayê de gavên mezin avêtin e û got, Komîna Fîlm a Rojava dengê gelên herêmê bi rêya sînameyê dighîn e cîhanê.

**Navenda nûçeyan**

Huner neynika civakan e, sînema jî yek ji hunerên nûjen e, ku dîrok, şaristanî û taybetmendiyên gelan tomar û belge dike, ji nifşekî bo yekî din vediguhêze. Ji dayik bûna sînamayê vedigere dawiya sedsala 19an, dema ku herdû bira (Ocêst û Lwîs) Lomyêr makîneyek şanîdana wêneyên livgir dahênan kirin, bi rêya wê, di 3ê Sibata 1895an de, herdu fîlmên xwe “Derketina Tirênê ji Kargehê” û “Gihîna Tirênê bo veniştingehê” li Ferensayê pêşkêş kirin. Li gor rexnevan û dîroknasê sînemegir Fîlîp Konglîton, pêşketina sînemayê di çar qonaxan re derbasbûye:Serdema seretayî, Serdema fîlmên bêdeng, Serdema berî şerê cîhanê a duyem, Serdema zêrîn.

**Girîngiya sînemayê bo Kurdan:**

Têkiliyeke xurt di navbera wêje û sînamayê de heye, derhênerên mezin jî nameyên xwe (sînaryo) li ser berhemên wêjeyî ava dikin, wekî mînak ku romanên klasîk yên naskirî bo fîlman sînaryoyên amadekirî ne, çiku sînaryo li ser bingeha çîrokekê ava dibe, anku kesayetî, gotin û dîmen tev di tevna çîrokê de ne, û bi van hêmanan derhêner dixwaze ku nameyekê bighîne temaşevanan, lê ne bi awayekî vekirî, bi awayekî sergirtî. Ji lewra pêdivête ku Kurd bo geşkirina çanda sînemayê û çêkirina fîlman bixebitin, û her çiqas ku dewleteke Kurdî li herçar perçeyên Kurdistanê tune be jî, divê ku zana û rewşenbîrên kurd di hemû tevgerên xwe de bo avakirina bingehên vê dewletê bilivin, û di barê vê de sînemayê bi kar bînin, çiku di roja me ya îroyîn de dewletên serdest û bihêz sînemayê wekî çekekê bi kar tînin, û sînema her çiqas alaveke hunerê be, alaveke propagandayê ye jî, ku dewletên navbuhurî û ser serê wan Emerîka, bi saya fîlman hem têkçûyînên xwe vedişêrin, û hem jî çand û jiyana xwe li cîhanê belav dikin, vêca divê ku Kurd vê yekê ji dest bernedin, nemaze ku li serdirêjahiya xaknîgariya kurdistanê gelek mijar hene ku hîn li ser wan xebatên fîlman nehatine kirin, anku çîrokine xwerû “sînaryo” hene, ku hîn derneketine ser rûwê







zemînê.

**Sînema kurdî**

Sînema Kurdî ji ber perçebûna welatê Kurdan di navbera çar dewletên serdest de, sînemayeke derengmayî û ne li gorî demê bû. Gelek sînemegerên Kurd gihiştin asteke pêşketî di sînemayê de, ji ber ku wan naskir ku kamîra wênegirê rasteqîne yê çav e, û çav jî wênegirê rasteqîne



yê sînemegerê zana ye ku ew nerîn û têgihiştina wan ji huner û jiyanê re derdiberîne, û wan karîne ku fîlmine girîng çêbikin, û bi rêya wan tevlî fistîvalên xwecehî, erebî û cîhanî bibin, herwiha xelatine nirxbuha jî bi dest bixin, ji bilî veguhestina kêşe, sirûşt, şaristanî, çand, rêwrêbazên gelê Kurd û xembariyên wî li tevahiya deverên cîhanê, û ji xwe girîngîya sînemayê û metirsîbûna wê ji vê yekê tê, û ji sînemegerên Kurd ên navdar, ji bakurê Kurdistanê sînemegerê bi nav û deng Yelmaz Gune, ji başûrê Kurdistanê Hunermend Selîm, ji rojhilatê Kurdistanê Behmen Qobadî, ji rojavayê Kurdistanê Ekrem Heydo ye.

**Hin fîlmên kurdî yên dirêj ku di salên dawîn de hatine kişandin:**

-Rê -Yilmaz Güney
- MEM Û ZÎN (1991) Umit Elçi.
-SÎYABEND U XECÊ (1993) Sahin Gok
-REWÎTÎYA BÊ DENG (1994) Ibrahim Selman
-RÊWÎTÎYA BER BI ROJÊ (1997) Yeşim Ustaoğlu,
-BIJÎ BUK U RIZGARÎYA KURDISTANÊ (1997) Hiner Saleem
-ZAROKÊ NEDIPÊYVÎ (1996), EM HER TIM KOÇBERIN (1998), Kazim Öz
-BA DÊ LI SER ME BIGIRÎ (1999) Abbas Kiarostami,
-TEXTÊ REŞ (2000) Samira Maxalbaf
-DENGÊ ERDÎ, DÊMA HÊSPAN SERXWÊŞ (2001) Behmen Qubadî
-JÎYAN (2001) Jano Rojbeyani
-FOTOGRAF (2001) Kazım Oz,
- AWAZA DAYIKA NIŞTIMAN (2002) Behmen Qubadî,
-QEWDEK GIYA (2003) Roland Suso Richter,
-Kusî Jî Dikarin Bifirin (2005) Behmen Qubadî

**Tevgera sînema li Rojava piştî şoreşa 19’ê Tîrmehê**

Beriya şoreşa Rojava, çewisandin û zexta ku gelê Kurd li Rojava rastî wê hatiye, bi awayekî neyînî bandor li warê hunera sînema kir. Lewra mirov nikare behsa tecrubeya sînemaya Rojava beriya şoreşê bike. Her wiha çanda sînemayê bi giştî belav ne bûbû. Ev tiştê di hejmara kêm a sînemayan de li bajarên Kurdî diyar bû. Ji bilî hinek sînemayan li Qamişlo û Amûde di salên 60 û 70`î de yên serdema borî. Her wiha holên sînemayê yên heyî hatin girtin an jî veguherî holên şahiyan. Tevgera sînemayê piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê, li herêmên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi gelek hewldan û ceribandinên di vî warî de derket holê. Belkî ya herî sereke jî tecrubeya Komîna Fîlm a Rojava ye.

**Damezrandina Komîna fîlm a Rojava**

Komîna Fîlm a Rojava li bajarê Dibêsiyê yê herêma Cizîrê di 14`ê Tîrmeha 2015`an de hate damezirandin. Piştre navendên komînê li Efrîn di sala 2016`an de, li Kobanê di 2018`an de û herî dawîn li bajarê Qamişlo hate vekirin. Armanca yekemîn a damezirandina komînê ew e ku çanda sînemayê di nava civak û gelê Rojava de belav bike, rastiyan bi rêya sînemayê bigihîne civakê û civakê bi rastiyê re di nava têkiliyê de bihêle. Komînê ji destpêka vekirinê ve, gelek film derandin jê `Darên bi tenê`, `Em zarok in`, `Hezkirin di rûyê qirkirinê de` tevî belgefîlmek girêdayî komkujiyên li dijî gelê Şingalê pêk hatine. Bi piştgiriya Navenda Welat a Çand û Hunera Demokratîk Komîna Fîlm a Rojava stranên bi dîmen û şoreşgerî di dema ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê de li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kişandin.

Komîna Fîlm gelek fîlmên girîng amade kirin. Ev film di gelek mihrîcanan de hatin pêşendan jê fîlma Ji bo azadiyê.Fîlma Ji bo azadiyê, behsa çîroka 100 rojên berxwedana şêniyan û têkoşeran li bajarê Surê-Amed li bakurê Kurdistanê li dijî arêtşa Tirk a dagirker dike. Film di gelek mihrîcanên cîhanî de hate pêşendan di nav de Mihrîcana Calcutta ya Hindistanê.

Ji fîlmên ku xelatên cîhanî wergirtine, fîlma Bajarên wêrankirî. Komîn Fîlm tevî xwendekaran film derandin. Film di Mihrîcana Mexico sala 2018`an de hate pêşendan û xelata fîlma herî baş wergirt.

Derbarê kar û xebatên Komîna Fîlm a, Endama komîna Fîlm a Rojava Nadiya Derwîş ji Rojnameya me re axivî.

Nadiya diyar kir ku komîna Fîlm a Rojava di gavên xwe yên destpêkê de hin zehmetî dîtin û wiha domand: “Beriya 2015’an hin karê sînema li Rojava hatibû kirin , lê karekî kesayetî bû û hin kesayetên ku ji sînemayê hez dikirin bi vî karî radibûn. Di 2015’an de, dema Komîna Fîlm a Rojava hat damezrandin, beriya wê bi demeke dirêj çanda Sînema li Rojava nema bû, ji ber wê destpêkê de zehmetî hatin dîtin.”

**Gavên komîna Fîlm a Rojava yên destpêkê**


Nadiya da xuyakirin ku Komîna Fîlm a Rojava bi pêşandana fîlmê zarokan dest pê kir û wiha got: “Komînê di gava destpêkê de, li seranserî herêmê Fîlm ji bo zarokan da pêşandan. Piştî wê Fîlmên kurdî ku li Kurdistanê hatine çêkirin hatin pêşandan, dûv re Fîlmên Komîna Fîlm a Rojava ji bo gel hatin pêşandan. Ji bo amadekirina lîstikvanan, dewreyên perewerdeyê hatin vekirin. Li Akademiya Hunerî ya Şehîd Yekta Herekol dewreyek hat vekirin, tê de hemû beşên hunerê hebûn , di nava wan de jî beşê sînemayê hebû, di beşê sînemayê de şagirt salekê dixwînin û di dawiyê de ji aliyê şagirtan kurteFîlmek tê amadekirin, piştî wê şagirt dibe endamê Komîa Fîlm a Rojava ku di sînema de kar bike.”

**’Gel bi her awayê dibe alîkar’**

Nadiya derbarê nêzîkatiyê gel ji karê sînema yê ku ji aliyê komîna Fîlm a Rojava ve tê amadekirin wiha got: “Destpêkê gel karê sînema nas nedikir û ji ber ku di dema berê de Fîlmên ne li gorî çanda civakê dihatin pîşandan, gel hin nerînên şaş li ser sînema stendibûn. Lê dema niha em gihiştine astekê baş û gavên pêroz hatin avêtin, xebatên girîng hatin kirin û encamên girîng jî, hatin bidestxistin. Lê piştî ku me dest bi çêkirina Fîlman kir, gel bi xwe ket nava Fîlman de û di kêşana Fîlman de beşdar bûn, hezkirinek hat avakirin, êdî gel çêroka fîlman nas kir, di çêkirina Fîlman de wekî kombars beşdar bûn , herwiha bûn alîkar û him jî zarokên xwe şandin da ku bibin lîstikvan. Bi çêkirina fîlmên JI BO AZADIYê, BERXWEDANA KOBANÊ, BERBÛ, ÇÎROKA BAJARÊN WÊRANBÛYÎ, û gelek kuerteFîlmîn din hişt ku gel moral ji komînê bigre, herwiha gel jî ji bo pêşxistina xebatên sînema yê komînê bû alîkar , di dema niha gel bi hemû awayan dibe alîkar.”

**’Êrîşên dagirkeriyê astengiyan li pêş me derdixe’**

Nadiya Derwîş bal kişand ser hin astengiyên ku derdikevin pêş karê komînê û wiha got: “ Êrêşên dewleta Tirk a dagirker yên ku li ser herêmê dewam dikin, yek ji zehmetiyên ku derdikevin pêşberî karê komînê, dema ku em pirojeyekê amade dikin, ekîpekî




mezin kom dibe, ev êrîşên domdar jî cihê xeteriyê ye. Herwiha komkirina lîstikvanan jî ji ber êrîşan hinekî zehmete. Lê tevî wê karê me bi serekeftî derbas dibe , gel ji me moral digire û em jî ji gelê xwe moral digrin. Di aliyê peydakirina lîstikvanan jî astengî hene, ji ber ku karê sînema beriya niha tinebû û ev tecrîbeyeke nû ye, kesê ku bi taybet karê wan lîstikvaniye, tune ne. Herwiha yek ji zehmetiyên ku em dibînin ; bêdengkirina bajar û taxekê, tevî ku gel dibe alîkar jî, lê zehmtî heye.

Endama Komîna Fîlm A Rojava Nadiya Derwîş di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Karê ku em dikin pir girîng û bi hêvî me bi dilê gel be, ji bo her kesê ku dikaribe lîstikvaniyê bike dereiyê me vekirî ye.”

# ‘Jin jiyan azadî’ û şoreşa jinê

**Buhar Ewrîn**

Di Rojhilata navîn de çandeke berxwedana jinê ya hezarê salan heye ku xwe dispêre rastiya civakî û dîrokî ya vê heremê. Di nava vê rastiyê de em her tim rola jinê û tekoşîna wan dibînin û di her welat û her herêmê de şopên wê tê dîtin. Raste gelek caran ew cografya bi şerên germ, desthilatdarî û dagirkerî tê nasîn lê di kêleka wê jî şahidiya dîrokî ji bo civakbûnê jî dike. Di nav wan hemû nakokiyan de, çanda jin-dayîkê her tim zîndî bûye û bi ruxmê hemû êrîşên îdeolojîk û leşkerî jî hîna vê çandê xwe parastiyê û di rehên civakê de tê jiyîn.

Kurdistan jî welatekî ku di sed saliya dawiyê de bûye navenda şerê desthilatdariya dewletên cîhanî û heremî. Ger em serhildanên kurdan li dijî wan êrîşan bi kurtî ber çavan re derbas bikin em ê bibînin di wan serhildanan de jin heyanî astekî cihê xwe di nave de girtiye. Dibe ku ne ligorî ku tê xwestinbe lê di Rojhilatê kurdistanê de jinên weke Xatûn Zadîne di berxwedana Kela Dimdimê, Qedem xêr û Mîna qazî di dîroka serdem de rolên pêşeng îfade dikin. Ev xeta berxwedanê hîna jî bi şêwazên cûda berdewam dike. tevgera azadiya jinên kurd xwe dispêre wan nirxan û ji bo pêşdecûna wan divê em ji wan tekoşîn û nirxan cuda nenirxînin. Jinên Îran û Rojhilatê



kurdistanê di warê tekoşînê de xwedî paşxanek dîrokî a kevne û tevgera ku niha li Îran û Rojihilatê kurdistanê ev saleke destpê kiriye encamê wan danehevên tekoşînê ne. Ji ber hikûmeta Îranê li ser koletiya jinê û binpê kirina mafê jinê hatiye avakirin. Ev rejîm bi rêka qanûn, sîstema malbat û navendên dînî li ser beden, ruh û mêjiyê jinê zext çêkirî. Lê jinên Îran û Rojhilatê kurdistanê tu car li hemberê wan zextan serî netewandine û her tim liberxwedane. Mînak di mijara Hicaba zorê tu car li gor xwestekê hikûmetê tevnegeryane û ev bûye hêrs û dijminahiyek hovane li hemberê jinê. Piştî qetilkirina Jîna Emînî keça kurd a ku li Tehranê ji aliyê ‘’polîsê exlaq’’ serhildanek girseyî li sernaserê Îranê bi dirûşma jin jiyan azadî destpê kir. Ev serhildan weke pêlek mezin li hemû welat û Rojhilata navîn û cîhanê belavbû û dengveda. Ji ber ev dirûşme weke felsefeya jiyanê hemû hêvî û daxwazên jinên Îran û Rojhilatê Kurdistanê û cîhanê tev digre nava xwe. Ji ber jiyan bi jinê re watedar dibe û ger pêywendiyê jin û jiyanê careke din ava bibe, azadî jî wî were bidest xistin. Ji bo vê yekê ev serhildan salek li pey xwe hişt û diyare ku jin û gelên Îranê dev ji doza azadî û demokrasiyê bernadin.

Piştî serhildanê pir kesan li ser kok û nasnama vê dirûşma ‘’jin jiyan azadî’’ nîqaş kirin û hinek bi zane bûn hewl dan koka wê berovajî bikin û bênasname bikin. Lê ji ber jin jiyan azadî xwe dispêre dîrok û çandeke bexwedanê, nekarîn bighîjin armanca xwe û efsûnî bûna wê careke derket holê. Her wiha di serhildanên dora vê dirûşmê û yekîtiyek xurt di navbera hemû nifşên civakê ji her netewe û bawerî ava bû û gihişt qonaxeke ku êdî rewş ne weke berê dibe. Niha rejîma Îranê bi hemû îmkanê xwe hewl dide wê serhildanê serkut bike û bi zîndan, îdam, îşkence û qedexeyan vê potansiyelê bifetişîne. Lê her çiqas şîddetê bikar tîne ewqas hêrsa gel ji bo berxwedan û tekoşîne zêdetir dibe. Ji xwe ev serhildan û rêbazê tekoşînê, hikûmeta Îranê jî di şokê de hişt û bawer nedikir serhildanek bi wî awayî ewqas berdewam bike û li ber xwe bide. Di bingehê xwe de ev qêrîna jinan tol û hêrsa hezaran salane û weke koza bin agir her carê bi cirûskek geş dibe lê dîyare wê tu car sar nebe. Jîna bû vejînek di heremê de û biskê wê weke ku Leyla Qasim jî gotiye wê bibe ala azadiyê.

Dirûşma “jin jiyan azadî” di dîroka tevgera azadiya jinên kurd de her tim bûye silogana kombûn, tekoşîn û berdewamî û herî zêde jî piştî şoreşa rojava, ev yek weke şoreşa jinê tê pênase kirin. Êdî jinên kurd di merasîmê şehîdên xwe de jî wê dirûşmê bikar tînin û ev dirûşme çandek di welat de ava kiriye ku her diçe kurtir dibe. Şoreşa jinê ya Rojava ne tenê li kurdistanê, belkî li hemû dunyayê deng veda û bû çavkaniya îlhamê ji bo hemû jinan û her kes qala wêrekî û berxwedana jinan li hemberê paşverûtiya çeteyên DAIŞ’ê û dagirkeriya tirkiyê dikin. Ji ber vê ev şoreş tenê di sînorên kurdistan û Rojhilata Navîn de sînordar nebû û bû fikir û felsefeyeke gerdûnî. Ji ber vê yekê di kurdistanê de ruxmê avakirina sînoran di navbera hemû beşên kurdistanê de, lê dîsa hestê welatparêzî di hemû beşên welat de zindiye. Bi şoreşa rojava re bi sedan jin û xortên Rojhilat tevlî şoreşa Rojava bûn û bi dehan jî şehîd bûne. Ji ber vê di pêvajoya şoreşa Rojhilat de jî gelê Rojavayê Kurdistanê û bi taybet jinan piştgiriya xwe ji bo jinên Îran û Rojhilatê kurdistanê re nîşan dan û careke din îsbat bû ku her çiqasî dijmin hewl dide bi rêbazên cûda kurdan ji hev qut bike, lê hîna jî ew rihê netewî û yekîtî bihêz berdewame. Çawa ku bi şoreşa Rojava re her kes berê xwe da Rojava û seferber bû. Di serhildanên Rojhilatê Kurdistanê de jî, li her çar perçên kurdistanê û Kurdên diyaspora piştgiriya xwe dan şoreşa jinê. Diyare ne tenê li Kurdistanê belkî li Rojhilata Navîn jî şoreşa civakî bi pêşengiya jinan û taybet jinên kurd pêk were. Ji ber jinên kurd di ezmûna xwe ya nêzî nîv sedsalî de xwedî danehev û tecrubeyên siyasî, civakî, bîrdozî û leşkerîne ku bingehek xurt ji bo şoreşa jinê pêk were û bighêje serkeftinê. Şoreşa jinê, şoreşek etîk û estetîke, ango xemilandina jiyanê û pêşeroja civakek demokratîk wê bi azadiya jinê pêkanbe.

Îro drûşmeya “jin jiyan azadî” bûye manîfesto û nexşe rêya şoreşa jinê û di destpêka sedsala nû de weke hêzeke rizgariyê bûye sembola jiyaneke nû û weke rûbareke rêya xwe dîtî û ber bi pêş ve diherike û em ê destkeftiyên wê di pêşerojê de bijîn . Weke ku Abdullah Ocalan jî dibêje ‘’dîroka koletiya jinê di çanda Rojhilata Navîn de veşartiye. Divê derketina wê jî li ser vê axê be’’ bêguman felsefa “jin jiyan azadî” qetandina hemû qeyd û bendên koletiyê li der dor jinê ye û mizgîniya azadî û demokrasiyê ji bo Rojhilata Navîn e.

# `Divê lêveger û konfedraliya jinan li ser asta Rojhilata Navîn bê avakirin`

**Navenda nûçeyan**

Komxebata têkildarî Komkujiyên Mezopotmyayê û bandorên wê li ser jinan, bi encamnameyekê bi dawî bû. Avakirina lêvgereke jinan, pêkanîna konfedraliya jinan li ser asta Rojhilata Navîn û xurtkirina eniyên hundirîn a jinan li ser tevahî astan, ji xalên wê yên sereke bûn.

Komxebata têkildarî komkujiyên Mezopotamyayê û bandorên wê li ser jinan bi dirûşma “Bi hêz û hevgirtina jinan em dê siyaseta parçekirinê û qirkirina gelan a Lozanê têk bibin” bi beşdariya zêdetirî 60 nûnerên ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi encanameyekê bi dawî bû.

Cîgira Meclisa Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê Semîre El Ezîz daxuyaniya dawîn a komxebatê xwend.

Daxuyanî wiha ye:

“Bi hêza hevgirtina jin emê parçekirin û qirkirina loznê têk bibin!

Rojhilata Navîn, Mezopotamya jî di nav de, her tim herêmeke ku bi erdnîgarî ya ku demografiya wê renga reng bû bi gel, pêkhate, ol û çandên wê yên herêmê gelek dewlemendkirine. Dostaniyek qedîm û cîrantiyek baş di navbera pêkateyên cihêreng her zindî bûn. Bermahiyên wê di civakê de hîna diyar e.

Lê bi destwerdana hêzên derve, ewropî, ku herêmê bi xwe nasnakin, sînorên netew-dewletên îro hatin xêzkirin. Ev sînorên ku hatine xêzkirin ne li gorî rastiya erdnîgarî û ne jî demografiya herêmê ne. Dema herêma ku em îro têde dijîn hate parçekirin




û sîstema netewe dewletan avakirin, nêrîn û îradeya gelên vê herêmê nehatin pirsîn. Bi tifaqên curbecur ên wekî Sykes-Picot, Sewre an jî 100 sal berê bi Îtifaqa Lozanê re sînorên gelan diyarkirin û bi wan re jî hestên nijadperestiyê hatin xurtkirin.

Ji ber fikrê yek netew, yek ziman, yek çand û yek al ku taybetmendiyên netewe-dewletan in, gelek komkujî û qirkirin li Mezopotamya pêkhatin, ku herî zêde ji aliyê Împaratoriya Osmanî û piştre jî Komara Tirk ve hatinkirin. Mirov ne tenê bi sînorên bêmantiq, bi siyaseta nijadperest jî ji siyaseta parçekirinê pêkhat. Kesên weke Kurd, Êzidî, Ermenî, Suryan û gelên bindest bûne qurbaniyên vê siyasetê. (Li vir mirov mînaka bide û mînaka piştgiriya gel ji hevdûre). Dostaniyên kevin bi vê şêweyê hatin xirabkirin, netew û olên cuda di herêmên me de êdî bi guman nêzî hevbûn û di encam de parçekirina gelên Rojhilata Navîn hişt ku hêzên derve bikaribin berjewendiyên xwe pêkbînin.

Em gelên Mezopotamyayê û li tevahiya Rojhilata Navîn heta roja me ya îro êşa van polîtîkayên parçekirinê û nakokiyên li herêmê dikşînin. Hemû netewe-dewlet bêîstîkrar in û di navbera hêzên cuda û gel û olên cihê de nakokî derdikevin. Pergala netewdewletê bi serhişkî li ser gel hatiye ferzkirin, lê ev pergal ne li gorî gel e. Herî zêde jin, zarok û mirovên xizan dibin qurbaniyên van şer û pevçûnên li Lubnan, Sûriye, Ermenistan, Sûdan, Iraq, Tirkiye an welatên din be. Bi van hevpeymanan hewl dan çarenusa gelê herêmê diyar bikin, lê gelê herêmê ev yek tiçar qebûlnekir. Ji destpêka zilm û zordariya ku ev rewş bixwere anî, li hemberî wê hertim jî serhildan û berxwedan hebûn. Di têkoşîna li dijî parçekirin û qirkirinê de jinên pêşeng cihê xwe girtine.

Şoreşa jinê ya li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî eşkere li dijî vê siyaseta parçekirinê derketiye û daxwaza jiyana hevbeş ya aştiyane kiriye. Tevgerên cuda yên jinan bi hevgirtina jinan nîşan dan ku li herêma wan têkiliyên cîrantiyê yên baş pêkan e. Jinên ji pêkhate, ol û çandên cuda xwe xweser bi rêxistin dikin û di heman demê de bi hev re ji bo azadiya civakê tevdigerin. Fikra Neteweya Demokratîk û sîstema Konfederalîzma Demokratîk tekane çareserî ye ku hemû herêmê bi dewlemendî, çand, ol û pêkhateyên xwe yên rengîn li kêlekahev di nava aştî û azadiyê de bijîn.

Weke jin erka me ye di çarçoveya Neteweya Demokratîk de ji nû ve avakirina têkiliyên dostane û cîrantiya baş bi gelên herêmê, ku bi hewldana rûnişkandina pergala netew dewletê di Rojhilata Navîn de ji aliyê hêzên derve ve hatin xirab kirin. Weke jin divê em li dijî modernîteya kapîtalîst û stûnên îdeolojîk ên netew-dewletê yên weke nîjadperestî û olperestiyê û ji bo avakirina sîstema demokratîk a gelan têkoşînê bilind bikin. Jin di vê mijarê de rola pêşeng dilîzin û bingeh ji bo jinan xurtir e.

1. Li gel berdewamiya krîza nasnameyan ku xwe dispêre pêkanîna her cure qirkirinê û belavkirina çanda nefretê, pêwîst e rola jinê di pêşengî û pêşengiya civakê de were xurtkirin û rola wê ya cewherî vegere. Ji ber ku jin bi tena serê xwe bi parastina nasnameya xwe ya dîrokî, çandî û civakî, bi pêkanînên asîmîlasyon, tinekirin û biyanîbûnê yên ferzkirî re rû bi rû dimînin.

2. Rûbirûbûna bertekên Peymana Lozanê, ji bo rêgirtin li dûbarebûna Peymana Lozanê bi formul û navên nû li gorî geşedan û pêşketinan û xêzkirina senaryoyan di birêvebirina herêmê de ji bo sedsaliya bê, li ber tinebûna bi qestî ya gelên herêmê, pêdivî bi rexnegiriyek heye. Xwendina dîroka yekitî û pêkvejiyana gelên herêmê, bi taybetî behsa Kurd-Ereb.

3. Ji xeynî pêşkêşkirina projeyên rewşenbîrî yên yekbûyî, derbaskirina qeyrana nasnameyan, qirkirin û biyanîbûnê ne pêkan e. Tecrûbeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku stûna wê felsefeya neteweya demokratîk a li ser bingeha biratiya gelan û azadiya jinê ye, ji bo rûbirûbûna polîtîkayên qirkirin û înkarê hêjayî balê û giştîkirinê ye.

4-Pêwîst e jin cihê xwe li navendên biryarê de bigire.

5-Divê lêvegereke jinan bê avakirin û sîstema konfedraliya jinan li ser asta Rojhilata Navîn were pêkanîn.

5-Ji bo ku dirûşma “Jin, jiyan azadî” li seranserî cîhanê belav bibe, divê destkeftiyên jinan werin parastina û ev ji jinan re bibin mîras.

7-Ji bo sekna li hember siyasetên li dijî herêmê, divê eniya hundirîn a jinan li ser tevahî asta, di aiyê parastinê û mekanîzmeya parastinê, were xurtkirin.

8-Divê siyaset û komkujiyên li dijî gelan di dîrokê de hatine kirin, werin eşkerekirin û çand werin parastina.

9-Ji bo pêkanîna hevbendiyeke jinan, divê yekitiya nîştimanî ya kurd pêk were û kongreya niştîmanî ya Kurdistanê ji bo jinên kurd were çêkirin.



# Şoreşa 19`ê Tîrmehê di salvegera xwe ya 11`an de

Dema Bihara Gelan li herêma Rojhilata Navîn ji Tunis û Misirê di 2010′an de dest pê kir, zemîna li Sûriyeyê ji bo tevgerê amade bû. Di 2011′an de li tevahî parêzgehên Sûriyeyê tevgerê dest pê kir. Lê çirûska wê ji Kobanê di 19′ê Tîrmeha 2012′yan de dest pê kir, lê armancên wê cuda bûn.

**Navenda nûçeyan**

Di nîvê Adara 2011`an de bi meşan tevgerekê li Sûriyeyê dest pê kir. Li tevahî parêzgehên Sûriyeyê meşên bi banga”hilweşandina rejîmê”bêyî bernameyeke aşkera, tevgerê dest pê kir.

Li Rojava ev yek cuda bû. Tevger li ser zemîneke şoreşgerî û felsefîk a giştî bû û banga guhartina rejîman dikir.

Sala 2004`an, dema serhildana Qamişloyê li dijî desthilata Baasê dest pê kir, zemînek ji bo Şoreşa 19`ê Tîrmehê ya 2012`yan ava bû.

Şoreşê li ku dest pê kir?

Şoreşê li Kobanê, dema gel tevahî hêzên ewlehiyê û saziyên girêdayî Partiya Baasê ji bajarê xwe derxistin, dest pê kir.

Şoreşê ji avahiya Partiya Baasê ya li Kobanê dest pê kir û gel şaxên ewlehiyê yên girêdayî Baasê neçar kirin ku radest bibin û ji bajêr derkevin. Her wiha avahiyên navenda çandê û yên hêzên hikumeta Şamê, Seraya, Weqfa Cotkaran, avahiya Gerînendetiya Herêmê, avahiya saziya leşkerkirinê, saziyên giştî yên mezêxeran, gerînendetiya darayî, girtîgeh û gelek navendên din hatin rizgarkirin.

Avahiya Partiya Baasê ya li Kobanê ku sembola desthilata navendî bû, piştî şoreşê bû navenda Rêveberiya Xweser a Kantona Kobanê.

Avahiyên din jî veguherîn navendên ji bo xizmetkirina gel û perwerdeyê.

Rêber Abdullah Ocalan di Tîrmeha 1979`an de ji Tirkiyeyê derbasî Kobanê bûbû. Li vî bajarê dîrokî



veguherîn çêbû. Piştî Kobanê, şêniyên Efrîn, Qamişlo û Hesekê saziyên Baasê ji herêmên xwe derxistin û xwe bi rêxistin kir.

Kobanê ku dergûşa Şoreşa 19`ê Tîrmehê ye, di 2014`an de bû sembola cîhanê ya têkoşîna demokrasiyê li dijî pergala hegemon.

Di Îlona 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê bi piştgiriya yekser a dewleta Tirk êrişî Kobanê kir. Lê piştî Rêber Abdullah Ocalan seferberî ragihand, bi sedan ciwan û keçên Kurd berê xwe da kantonê, her wiha Kurdên li tevahî parçeyên Kurdistanê, ciwanên ji welatên cuda berxwedaneke dîrokî raber kir. Di encamê de DAIŞ cara yekemîn têk çû.

Piştî vê serkeftinê, projeya Rêveberiya Xweser berbelav bû, ji Kobanê ber bi Efrîn û Cizîrê ve, dûre ber bi Reqa, Tebqa, Minbic, Dêrazorê, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê ve çû. Ne tenê ev, lê şoreşa ku li pêş avahiyekê li Kobanê dest pê kir, hişt şêniyên parêzgeha Siwêdayê ya li başûrê Sûriyeyê jî gelek caran xwepêşandanan li dar bixin û banga rêveberiyeke xweser mîna ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bikin.

# ‘Hevgirtina pêkhateyan dê dagirkeriyê têk bibe’

**Şêx Mihemed Saqid El Isêdî diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker hewl dide fitneyan derxe û vîna pêkhateyên herêmê tune bike da ku dagir bike û got “Bi hevgirtinê me dagirkeriya Fransî derxist û em ê dewleta Tirk a dagirker jî derxin.”**

Şêx û rûspiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ji destpêka krîza Sûriyeyê ve destwerdan û komplo li dijî gel û herêmê pêk anîn; çete derbasî Sûriyeyê kirin, çek û cebilxane da wan, parçeyên mezin ji herêmê dagir kirin, mal û milkên şêniyan dizîn û demografiya herêmê guhart. Li hember wê divê tevahî pêkhate hevgirtî bin, da ku dagirkeriyê ji xaka xwe derxin.

Şêxê eşîra Binî El Isêdî û berdevkê rûspiyên Minbic û gundewarên wê şêx Mihemed Sadiq El Isêdî behsa rola pêkhateyan a li dijî dagirkeran kir û wiha got: “Rola eşîran û pêkhateyan di rizgarkirina xaka Sûriyeyê ji dagirkeriyên Osmanî û Fransî de mezin bû. Şêniyên herêmê li dijî dagirkeriyê sekinîn û bi yekitiyê dagirkerî bi dawî kir û ji xaka xwe derxist.”



El Isêdî wiha domand:”Dewleta Tirk a dagirker û tevahî dijminên biratiya gelan hewl didin ewlehî û îstîqrara herêmê têk bibin, fitneyan derxin, da ku mozaîka civakê ji hev bixin û vîna gelên azad têk bin, da ku herêmê bi hêsanî dagir bikin.”

El Isêdî wiha pê de çû: “Em ê li hember planên dewleta Tirk a dagirker ên qirêj bisekinin û bi hevgirtinê û xwespartina li fikra neteweya demokratîk wan derxin. Mîna me dagirkeriyên Fransî û Osmanî derxistiye.”

Şêx Mihemed Sadiq El Isêdî wiha dawî li gotina xwe anî: “Divê ji bo Sûriyeyeke pirreng û nenavendî, pêkanîna jiyaneke hevbeş dûrî nakokiyên dewletên çav berdane herêmê ku dagir bikin, têkoşînê dewam bikin.”

# Gireva birçîbûnê ya Dag û Er di roja 59`an de ye

**Mazlûm Dag û Abdurrahman Er ku li Girtîgeha Hewlêrê dîlgirtî ne, li hemberî zexta PDK’ê ya li xwekirina cilên bi yek tîpî û kiryarên xerab, 59 roj in di greva birçîbûnê de ne.**

Di 17 Tîrmeha 2019’an de li dijî endamê MÎT’ê Osman Kose yê di Sefaretxaneya Tirkiyeyê ya Hewlêrê kar dikir êriş pêk hat. Di êrişê de Kose û welatiyê Iraqê Nerîman Osman û welatiyê ji Hewlêrê Beşdar Ramazan hatibûn kuştin. Mazlûm Dag û Abdurahman Er bi sedema vê êrişê hatibûn girtin. Dag û Er li Girtîgeha Hewlêrê tên ragirtin.

Mazlûm Dag û Abdurrahman Er, ji roja ku xistin Girtîgeha Hewlêrê û vir ve binpêkirina mafên wan timî dikeve rojevê. Mazlûm Dag û Abdûrrahman Er herî dawî ji ber zexta li xwekirina cilên bi yek tîpî di 18’ê Gulanê de ketin greva birçîbûnê. Çalakiya Dag û Er di roja 59’an de didome û rewşa tenduristiya wan her ku diçe xirabtir dibe. Tevî gelek bangan jî heya niharayedarên herêmê li ser rewşa Dag û Er ti daxuyaniyek û helwestek nîşan nedan.

Mazlum Dag di 23’yê Hezîranê de bi rêya telefonê bi malbata xwe re axivî. Dag ragihandiye ku her diçe tenduristiya wan xirabtir dibe û gotiye:“Rêveberiya girtîgehê 10 roj in ne li me dipirse ne jî tê cem me. Dibêjin ‘li nexweşxaneyê bijîşk tune ne û derman tune ne.’ Me bi mirinê re rû bi rû hiştine.



Abdûrrahman 20 kîlo dane. Tenduristiya wî nebaş e.” Dag diyar kiriye ku wî jî 10 kîlo dane û nikare zêde biaxive.

**Ji bo Er û Dag bang**

Hêjayî gotinê ye di 7’ê Tîrmehê de Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK’ê ji bo Mazlûm Dag û Abdurrahman Er ên ku ev nêzî 2 mehin li dijî pêkanînên dijmirovî yên li girtîgeha Hewlêrê di greva birçîbûnê de ne bang li her kesî kir ku bikeve nava tevgerê.

Însiyatîfa Hevgirtinê Ya Li Dijî Darvekirinê derbarê rewşa Mazlum Dag û Abdurrahman Er de diyar ku li gorî xizmên Dag û Er ragihandîn vîtamîna B1 ya ku divê ji bo çalakgerên di greva birçîbûnê de ne bê dayîn, nayê dayîn û dan zanîn ku her duyan jî gelek kîlo dane û dema dirabin serxwe zehmetî dikêşin. Herwiha destnîşan kir ku ew nikarin xwe bigihînin rayedarên girtîgehê û hewldanên parêzeran jî bê encam dimînin.

Her wiha di 1’ê Tîrmehê de KNK’ê derbarê Mazlum Dag û Abdurrahman Er ên di greva birçîbûnê dene bi daxuyaniyekê bang li Rêveberiya Hewlêrê kir. KNK’ê di daxuyaniya xwe de got;“Bangewaziya me destpêkê bo hukumeta Hewlêrê û bo hemû partî, rêxistin, sazî û kesayetiyên di mijara parêstina mafê kesên girtî de bibin xwedî helwest ku mafê girtiyekî di zindanê de çi be pêwîste her du ciwan xwidan heman mafî be.”

Herî dawî duh KCDK-E’yê bi daxuyaniyekê ji bo Dag û Er banga çalakiyan kir û xwest ku jiyana Mazlûm Dag û Abdûrrahman Er bê parastin, destûr ji hevdîtina malbat û parêzerên wan re bê dayin û tavilê bêne berdan. Lewma di serî de Neteweyên Yekbûyî bang li rêxistinên mafên mirovan hate kirin ku xwedî li daxwazên Mazlûm Dag û Abdûrrahman Er derkevin. KCDK-E’yê diyar kir ku li Ewropa, Awûstralya û Kanadayê wê roja 14’ê Tîrmehê, li ber Serkonsolosxaneyên Iraq, Başûr û nûnertiya UNO çalakiyên şermezarkirinê lidarbixin û banga tevlîbûnê li gel kir.

Hêjayî gotinê ye ku Dag û Er li dijî kiryarên xerab û êşkenceyê di 28’ê Îlona 2022’an de dest bi greva birçîbûnê kiribûn û ji ber ku daxwazên wan wê demê hatibûn qebûlkirin di roja 14’an a grevê de çalakî bi dawî kiribûn.

Her wiha herdu girtî di 13’ê Sibata 2022’an de jî li hemberî binpêkirina mafan ketibûn rojiya mirinê. Piştî ku soz hate dayin ku wê dawî li binpêkirinan bê anîn çalakî di roja 9’an de bi dawî bûbû.

# Xerîb Hiso: Sîstema Hevserokatiyê vîna jinê diyar kir

Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji encama dayîna berdêlên binirx, gelek destkeftiyên giranbuha bi xwe re anîn û sîstema Hevserokatiyê jî yek ji van destkeftiyan e. Xerîb Hiso da tekezkirin ku jinê muhra xwe di pêşveçûna şoreşê de xist û xwe isbat kir.

**Hemza Sêvo/ Qamşlo**

Sîstema Hevserokatiyê, yek ji sîstemên rêvebirinê ye ku bingehê wê azadiya jinê û civakê digre nava xwe. Partiya Yekîtiya Demukratîk (PYD) biriyara pêkanîna vê sîstemê di Kongira xwe ya 5`emîn de bidestpêkirina Şoreşa Rojava re, di sala 2012`an de da.

Hêjayî gotinê ye ku Sîstema Hevserokatiyê bû yek ji berhemên dara şoreşa azadiyê ya ku bi hezaran keç û xort xwe kirin cangoriyên wê û bi xwîna dara azadiyê av dan. Herwiha sîstema hevserokatiyê ji bo Şoreşa 19`ê Tîrmehî li rex deskeftiyên bi nirx yên din jî bû berhemeke giranbuha û bêhempa. Di hemû sîstemên welatên cîhanê de, di nav de dewleta Sûriyê jî, sîstema serokatiyê di nav saziyên civakî, saziyên leşkerî û partiyên siyasî de didin pêkanîn û meşandin û mafê jinê ji kar û xebata curbecur bêpar dihêlin. Lê li Rojavayê Kurdistanê bi saya fikrên demukrat û azdîxwaziyê yên Rêber Ocalan û Tevgera Azadiya Kurdistanê, Sîstema Hevserokatiyê hat avakirin. Vê sîstemê li Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê derî ji bo xebata jinên kurd, ereb, xiristyan û hwd... re vekirin. Li gorî vê yekê bi saya vê sîstemê baweriya jinê bi hêza wê xurtir bû û hin bi hin derbasî nav hemû saziyên Rêveberiya xweser bû, ji komîn û meclisan heya partiyên siyasî û hwd.

Niha jî jin û mêr bi hev re bi erkê rêvebirina saziyên sivîl, leşkerî, xizmetguzarî, perwerdeyî, çandî û partiyên siyasî radibin û biriyaran bi hev re didin. Ev gava pîroz ku li Rojava hat avêtin bandoreke mezin yek ser li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir, herwiha li cîhanê jî bû çavkaniya coş, kelecan û hêviyê. Têkildarî Sîstema Hevserokatiyê, Hevserokê Tevgera Civaka Demukratîk (TEV-DEM) Xerîb Hiso ji Rojnameya me re axivî.

**‘Şoreşa 19`ê Tîrmehê şoreşa azadiya gelan e’**

Hiso diyar kir ku Rêber Apo serdestiya hikumeta Şamê û Opozisyonê têk bir û bi hêz û vîna gelên azad şoreşa Rojava destpê kir û wiha axivî:” Şoreşa ku qaşo Opozisiyona Sûrî dest pêkir û bi navê şoreşa azadiya gelê Sûriyê bang dikir, di rastiyê de newisa bû. Tiştê ku vê şoreşê bi gelê Sûriyê kir ji kiriyarên hikumeta Şamê xirabtir bûn. Herwiha êdî ev gel çewsandinê jiyan dike. Lewma Rêber Apo dît ku pêwîstiya gelê kurd, heremê û cîhanê jî bi şoreşekê heye. Şoreşeke ku gelê Sûriyê bigiştî li dijî desthilatdariyê serî rake û êdî ji koletî, bindestî û qirkirinê re bêje na. Hêjayî gotinê ye ku ev şoreş bi saya Rêber Apo û Tevgera Rizgariya Kurdistanê hêzeke mezin da gelê Sûriyê. Ev şoreş yek ji encamên xebat û têkoşîna 40 salî ya Rêber Apo û PKK`ê ye. Êdî bi pêşengtiya jinên azdîxwaz û gelê şoreşger, şoreşa Rojava gihişte vê astê û bû şoreşeke serdemî û xwedî bingeh û felsefeyeke bêhempa. Di heman demê de jî berdêlên giranbuha ji vê şoreşê re hatin dayîn ku me di ber Şoreşa 19`ê Tîrmehê de bi hezaran şehîd dan. Ji aliyekî din ve jî gelek destkeftî hatin bidestxistin ku yek ji van destkeftiyan jî Sîstema Hevserokatiyê ye.”

**‘Sîstema Hevserokatiyê qehremaniya jinê diyar kir’**

Xerîb Hiso da zanîn ku jinê muhra xwe di pêşveçûna vê şoreşê de xist û qehremaniya wê derxiste pêş û wiha domand: “ Berî niha gelek şoreş li cîhanê çêbûne, lê tev jî ji rastiya civakê dûrbûn û ji daxwazên gel yên ji bona azadiyê nebûne bersiv. Sedem jî, ji ber ku



jin ji van şoreşan hatinbûn dûrxistin. Herwiha ev dûrxistin bi xwe zihniyeta desthilatdariyê ye û tu wateya şoreşê venahewîne. Azadiya jinê, serkeftina welat û şoreşan bi xwe re tîne. Ango azadî mercekî bingehîn yê bidestxistina welatekî azad e. Di Şoreşa Rojava de li ser xeta şoreşên beriya xwe nemeşiya, lê belê jin bi coş û vîneke mezin tevlî wê bû. Jinên kurd, ereb, xirstiyan bi mêran re weke hevserok di tevahiya sziyên Rêveberiya Xweser de karê rêvebirinê kir. Ev sîstem xwedî cudabûneke ji sîstemê rêvebirinê yên tevaya cîhanê. Herwiha vê sîstemê dengvedanek li ser asta cîhanê veda û bandoreke gelek mezin li gelên cîhanê kir. Ji ber ku jinê di pêşveçûna şoreşê de kar û xebateke giran buha di warê siyasî, civakî û aborî da meşandin û ew di her warê jiyanê de bû pêşenga civakê.

# Şoreş bi ciwanan destpêkir wê bi ciwanan serbikeve

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Ciwanên Şoreşger diyar kirin ku êrîşên dewleta tirk a dagirker, bi hemû şêwazan li ser gel û bi taybet jî li ser ciwanan têne meşandin. Herwiha dan zanîn ku mîna Rêber Apo gotiye, me bi ciwanan destpêkir û em ê bi ciwanan serbikevin.**

Dewleta tirk a dagirker Ji destpêka şoreşa Rojava û heta niha, ji bo têkbirina vîna gel, li hemberî gelên herêmê êrîşan pêk tîn e, herwiha bi tevahiya rêbazan hewil dide ku li ser ciwanan jî şerê taybet bide meşandin, ji bo ku ciwanan ji rastiya Şoreşa Rojava dûr bixe.

Derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker ku li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê meşandin û armanc je hedefgirtina ciwanane, berdevka ciwanên şoreşger ya bajarê Dirbêsiyê Elîza Hiso û ciwanê bi navê Zîr Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

Elîza Hiso di derbarê êrîşên li ser bakur û rojhilatê sûriyê wiha got: “Ev demeke dewleta tirk a faşîst êrîşên xwe li ser Rojava zêde kiriye û niha jî pêvajoyek şerekî taybet li ser jin û ciwanan pêk tîne, her



Elîza Hiso

wiha dewleta tirk a dagirker bi hemû amûrên di destê wê de êrîş dike. Ji ber ku hêviya dewleta tirk a beriya sedên sala ewe ku tunekirina gelê kurd, gelê ku doza demokratîkiyê dike tune bike.Ji ber vê yekê her tim bi riya êrîşên xwe dide xuyakirin, eger bi şerekî taybet be an bi şerekî giştî be jin û ciwanan dike armanca êrîşê xwe.”

**‘Dewleta tirk Şerê taybet li ser ciwanan dimeşîne’**

Elîza Hiso diyar kir ku armanca dewleta tirk a dagirker ji êrîşên li ser ciwan û jinan, ewe ku bingeh û avakerên civakê ji holê rake û got: “Êrîşên ku li ser ciwana tên kirin, ji pilanên qirêji yên dewleta tirk a dagirker re, her wiha di medyayên civakî de jî gendeliya xwe belavî nava ciwana dike. Ji ber nas dike



Zîr Qamişlo

wê azadiya gelê Kurdistanê bi destê ciwanan pêk were. Ji ber vê sedemê dewleta tirk a dagirker, hewldanê xwe ku ciwanan ji rastiya Şoreşa Rojava dûr bixe, vê yekê bi riya êrîşên ku tê de ciwan tê hedefgirtin, tê kirin.”

**‘Şoreşa Rojava bi destê ciwanan wê biserkeve’**


Elîza Hiso di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo me Şoreşa Azadiyê li dar xist, em weke tevgera ciwanan roleke mezin ji me tê xwestin, ji ber ku pêşeroja civakê ciwanin û yên ku Şoreşê jî biserbixin ciwanin. Her wiha Şoreş wê bi destê ciwanan bê xêzkirin ku bibin bersivek ji dewleta tirk a dagirker re.”

**‘Wê bi hêza ciwanan êrşên dagirkeran têk biçin’**

Ciwanê bi navê Zîr Qamişlo jî da zanîn ku armanca sereke ya dewleta tirk a dagirker ji êrîşên li ser ciwanan, astengkirina belavbûna fikir û felsefeya Rêber Apo ye û got: “Ji ber ku tevgera Ciwanên Şoreşger li ser bingeha fikir û felsefeya Rêber Apo hatiye avakirin,her wiha felsefeya Rêber Apo netewa demokratîke ji ber vê sedemê dewleta tirk hewil dide sînorekî li pêş vê felsefeyê deyne da ku belav nebe, ji ber wê ciwanan dike hedef. Lê bi hêza ciwanan wê tevahiya êrşên dagirkeran têk biçin.”

**‘Ciwan pêşeroja civakê ne’**

Zîr Qamişlo axaftina xwe wiha qedand: “Dewleta tirk a dagirker ji bilî êrîşên rojane şerekî taybet jî li ser ciwanan dimeşîne. Êrîşên dagirkeriyê bi awayekî hovane li dijî herêmên me dimeşîne. Herwiha armanca dewleta tirk a dagirker bi êrîşên li ser ciwanan, ewe ku ciwan pêkhateyên girîn û pêşerojên civakê ne. Bi hevgirtina tevahî ciwanan emê êrîşên faşîzmê têk bibin.”



## Li NATO’yê Tiyatroya Tirkiyê

**Ahmet Aktaş**

Civîna bilind a NATOyê, li Vilniusa paytextê Litvanyayê pêkhat.
Bêgûman civînek giring e û di demek pir dijwar de hat lidarxistin. Her wiha divê li ser vê civîne axaftin û şîroveyê berfireh werin kirin. Jiber ku cîhan ketiye nava pêvajoyek gelek aloz û xeter. Bi gotinek hîn zelaltir; ketiye pêvajoya cenga cîhanî ya sisyan.
Lewma serkêşên Hevpeymana NATO Emerîka û Britanya, ji bo pêşiyê li mezinbûn û berfirehbûna hevbendiya ku Rûsaya û Çîn serkêşiya wê dike bigirin, ketina nava hewldanên lezgîn. Jixwe, jiber vê armancê şerê Ukraynayê wan derxist. Û nuha dixwazin li ser vî şerê malxerab, hez dikin cengê berfirehtir bikin û bixin asta gelemperî ya cîhanî.
Ew pelepele û leza wan a Berfirehkirina Hevpeymana NATOyê, ji ber vê armanca wan ya mezin a di asta cîhanê de ye.
Ne bi tenê Finlandiya û Swêdê bixin NATOyê, armanc; hemû dewletên cîranê Rûsya û Çînê bixîn nava vê hevpeymanê. Jixwe, hez dikin hema yekser Ukraynayê bikin endamê NATOyê.
Bê gûman, van hewldanan mezinkirina NATOyê li dora Rûsya û Çînê giring in û xeterek mezin diafirîne li ser jiyana mirovahî-civakî, erdnîgarî û hemû xwezaya cîhanê.
Lê ya trajî-komîk helwesta diktatorê faşîst R.Erdogan û sernivîs û şîroveyên çapemeniya Tirka ye. Weke ku ew mijarên li jor hat bahs kirin; tune be, ya jî ji nedîtî tên an jî eger hebin jî, aktorê van bûyerên cîhanê R.Erdogan e!
Ji gelemperiya civînê pirtir behsa hevdîtinên dukesî yên R.Erdogan dikin; “bi serokê filan dewletê re rûnişt, gelek mijarên giring axivîn û serkeftî derbas bû” û hwd.
Bi taybetî jî hevdîtina wî bi Biden re, serkeftin û deskeftina herî mezin didin nîşandan.
Hilbet van daxwiyanî û pesindariya pûç a bêbingeh, ji bo xapandina gel û rayagiştî ye. Lê belê ne mîna tiyatroyê ye jî, dibe ku mirov bêje skeca Tirkiyeyê li nav NATO tê lîstin.
Belê yên şariza, dizanin ku li pişt van wênê, dîmen û devlikeniya derewîn, armancên dewletên serwer ên cîhanê yên stretejîk ên ji bo bikaranîna van dewletan a di şerê cîhanê de heye.
Dewleta di rêza yekemîn de jî dewleta R.Erdogan e û weke heta nuha çawa dan xebitandin, nuha dixwazin hin pirtir bidin bikaranîn, bi taybetî jî li dijî Îranê, Sûriyê û hwd.
Hilbet Îran, Rûsya û Çîn jî, van lîsk û planên li dijî xwe dibînin û ew jî di nava amadekarî û hewldanên peralel ên dijberî xwe de ne.
E ha weke mînak, Serokomarê Îranê I.Reisî, piştî yanzde salan derket gera 3 rojan a Efriqayê. Berî nuha jî, piştî Endonezyayê çûbû 3 dewletên Latin Emerîka(Kuba, Nikaragua û Venezuella)yê. Îran, berî hefteyekê jî beşdarî Hevalkariya Şengayê bûbû.
Jixwe Rûsya û Çîn, li dijî eniya dijberî xwe çi siyset û kiryaran didin meşandin tên dîtin û tên zanîn.
Erê her çendîn, hilwestên Diktatorê Tirkiyeyê mîna skecê were dîtin jî, serwerên wî, ji bo kar pê bide kirin dîsa ew li serokdewletiyê hiştin. Karê wî yek jî, dijminatiya gelê Kurdistanê ye. Divê ev yek ticar neyê jibîr kirin û li goreyê wê amadekarî werin kirin.



# Lozan qirkirina sedsalê ye

**Demhat Tolhildan**

Bi Peymana Lozanê ya ku sedsal berê pêk hat, di 24’ê Tîrmeha 1923’an de gelê Kurd ji aliyê pergala cîhanê ya hegemonîk ve nehat naskirin û hate tunekirin. Ji Lozanê heta niha li ser gelê Kurd polîtîkaya îmha û qirkirinê tê meşandin. Di van sedsalên dawî de hemû hêzên navneteweyî ji bo qirkirina Kurdan her cure piştgirî dane. Îro di siyaseta navneteweyî de Kurd û mafên wan nayên naskirin, di her firsendê de îmha li ser Kurdan tê ferzkirin. Di sedsala Lozanê de dema ku Kurdan li dijî qirkirinê li ber xwe dan, sîstema navneteweyî jî xebatên xwe yên ji bo temamkirina qirkirina Kurdan didomîne.
Peymana Lozanê ku di 24’ê Tîrmeha 1923’an de pêk hat, weke peymaneke ku çarenûsa gelên li vê erdnîgariyê dijîn bi taybetî gelê Kurd diyar kir, di dîrokê de hate nivîsandin. Bi sînorên nû yên piştî Împaratoriya Osmanî hatin afirandin, ne tenê erdîngarî, civak jî parçe bûn. Di bingeha vê parçebûnê de gelê Kurd û Kurdistan hebû. Di Peymana Lozanê de gelê Kurd nehat naskirin û hate tunekirin. Dewletên heremê, bi taybetî jî dewleta Tirk, ji nezaniya Kurdan cesaret girtin, her ku ji destê wan hat, Kurdan di qirkirinê re derbaskirin. Piştî Lozanê gelê Kurd ji aliyê siyasî, çandî û fîzîkî ve di nava qirkirinê de ma. Kiryarên herî hovane yên qirkirin û komkujiyên ku dîrokê heta niha dîtiye, ji aliyê gelê Kurd ve hatiye jiyîn. Gelê Kurd li hemberî van polîtîkayên qirkirinê yên sed salî bi berxwedaneke bê eman bersiv da û li ber xwe dide.
Mirovatî bi şerê cîhanê ket sedsala 20’an. Şerê cîhanê yê yekem di navbera salên 1914 û 1918’an de pêk hat. Ev şer li herêmên ku Împaratoriya Osmanî lê serdest bû û li erdnîgariya Ewrûpayê pêk hat. Li aliyekî şerê Îngilîstan-Fransa-Îtalya- Rûsya li aliyê din Elmanya-Osmanî-Awistralya- Macarîstanê cih girt. Di encama şer de împaratoriyên Osmanî û Awûstûrya-Macaristan ji hev belav bûn û netewedewletên nû derketin holê. Pêvajoya guhertina sînoran demek dirêj girt. Di vê heyamê de di navbera dewletan de li ser maseyê di bin navê muzakereyên aştiyê de peyman hatin kirin. Di peymanên ku ji bo Rojhilata Navîn û Mezopotamyayê hatin kirin, ji bo Kurdistanê planên cuda hatin çêkirin. Erdnîgariya




Kurdan a ku di sala 1639’an de bi peymana Qesir-î Şîrîn di navbera împaratoriyên Sefewî û Osmanî de bû du parçe, di sedsala 20’an de bi peymanan bû çar parçe. Di 10’ê Tebaxa 1920’an de Sevr, 24’ê Tîrmeha 1923’an de Lozan, 5’ê Hezîrana 1926’an de bi peymana Enqereyê Kurdistan di navbera çar dewletan de hate parvekirin. Di nava van peymanan de ya ku çarenûsa Kurdan diyar dike Peymana Lozanê ye. Ji ber ku nûnerên gelê Kurd di Lozanê de cih negirtin. Nêzîkatiya siyaseta navneteweyî ya li hemberî gelê Kurd eşkere bû. Li Lozanê qet behsa Kurdan nehat kirin û paşguh kirin.
Gelê Kurd ê bi hezaran sal in li Mezopotamyayê jiyaye û xwedî çanda herî kûr e, bûye qurbaniya berjewendiyên dewletên hegemon. Hebûna Kurdan di nava pergala hegemon a nû de cih negirt. Li erdnîgariya Kurdistanê ti tişt wekî berê nabe. Ji bo Kurdan civaka herî kevn a erdnîgariyê wê pêvajoya îmha, înkar û qirkirinê destpê bike. Hêzên hegemonîk ên ku bi dewleta Tirk a nû avabûyî li hev kirin, wê misogerkirina ku ti maf ji gelê Kurd re neyê dayîn. Bi taybetî hêzên emperyalîst ên bi pêşengiya dewleta Îngilîstanê bi polîtîkaya par bike, perçe bike û hukûm bike qirkirina Kurdan îmze kiribûn. Êdî gelê Kurd di qada navneteweyî de nedihat naskirin û di warê siyasî de behsa Kurdan nedibû. Destûr dan dewletên herêmê, bi taybetî jî dewleta Tirk ku qirkirina Kurdan pêk bînin. Hemû cîhan wê Kurdan bi tenê bihêle. Di siyaseta cîhanê de kesî Kurd nedidîtin û bi Kurdan re hevaltî nedikir. Gelê Kurd weke gel bê parêzer bi xwe re ma. Ger îro jî behsa pirsgirêka Kurd a ku sedsalê berdewam dike, mîmarê vê yekê hêzên navneteweyî ne. Tu dewletekên herêmê bêyî piştgiriya navneteweyî nikarîbû qirkirina Kurdan pêk bîne.
Dewletên nû yên ku piştî peymana Lozanê li herêmê hatiye ava kirin, wê xwe li ser qirkirina Kurdan teşe bikin. Hemû pêkhateyên neteweyî yên dewletên Iraq, Îran û Sûriyeyê, bi taybetî jî dewleta Tirk, wê li ser esasê tunekirina gelê Kurd karekterê xwe bi dest bixin. Di hemû makezagonên ku hatin amadekirin de cih nadin Kurdan. Ji niha û pê ve her tişt li ser navê Kurd û Kurdistanê wê qedexe bihata dîtin. Di demokrasî û nirxên çandî yên bi giştî behsa wan tên kirin de ferzkirina yek neteweyê jî wê derkeve pêş. Di demokrasiya sedsala nû de ziman, çand û hebûna Kurdan wê bihata qedexekirin. Êdî ti kesî nikarîbû li ser navê gelê Kurd siyasetê bike. Ger Kurdan siyaset bikirana, wê weke bandî, serhildêr, cudaxwaz bihatana pênasekirin û qetlîamên wan ferz bihatana dîtin. Dewleta Tirk bi hincetan dixwest bi artêşa xwe re li dijî herêmên Kurdan sefe-ran pêk bîne. Li dijî gelê Kurd şerekî qirkirinê dabû destpêkirin. Di navbera salên 1923-1938’an de gelê Kurd di qirkirinekê re derbas dibe. Di vê serdemê de her çiqas gelê Kurd bi 28 serhildanan hewl da xwe biparêze jî encam neguherî.
Dewleta Tirk komkujiyên mezin li ser gelê Kurd pêk anî, hemû hêza artêşê û bi piştgiriya navneteweyî bi xwe re bir. Kurdistan ji nû ve hate dagirkirin. Hemû pêşengên gelê Kurd û yên tevlî serhildanê bûne hatin darvekirin. Teroreke tam wê li ser Kurdistanê bihata kirin. Bi milyonan Kurd wê bi awayekî hovane bên qetilkirin. Yên ku ji komkujiyê sax mabûn jî wê ji xaka xwe bên derxistin û mişext kirin. Dema ku pêkanînên herî hovane yên dîrokê li ser erdnîgariya Kurdistanê dihatin kirin, hêzên navneteweyî wê bi bêdengî li vê qirkirinê temaşe bikin. Tevî bangên hemû nûnerên Kurdan, hêzên navneteweyî yên ku deng dernexistin jî wê her cure piştgiriyê bidin dewleta Tirk.
Îcar di sed salên Peymana Lozanê de ji bo Kurdan çi guherî? Bi rastî jî di warê siyaseta navneteweyî de tiştek neguheriye. Tevî hemû rêxistinbûn û têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd, hêzên navneteweyî hê jî statûyekê nadin Kurdan û weke gel nas nakin. Îro li Rojava pêvajoyeke şoreşgerî diqewime. Di nava hêzeke koalîsyonê de ku gelek dewletên navneteweyî jî di nav de ne, Kurd hêza herî çalak in. Di şerê li dijî çeteyên DAIŞ’ê de aktorê sereke tevgera azadiya Kurd bû. Tevî şoreşa deh salên derbasbûyî jî Kurd di warê siyasî de nehatine naskirin. Îro Kurd ji bo ti civîneke navneteweyî ya ji bo bidawîkirina şerê li Sûriyê tê lidarxistin nayên vexwendin. Weke sedsala borî, armanca hemû hevdîtinan jî tunekirina destkeftiyên Kurdan û rêgirtina li pêşketina demokratîk e. Îro dewleta Tirk li her derê êrîşî gelê Kurd dike, lê ti hêzeke navneteweyî dengê xwe dernaxe. Di dema ku bajarên weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hatin dagirkirin, dewleta Tirk ji hêzên navneteweyî piştgiriyê digre. Dîsa dema li çiyayên Kurdistanê li dijî gerîla her cure çekên qedexekirî bi kar tînin, hêzên navneteweyî dengê xwe dernaxin. Axa Başûrê Kurdistanê tê dagirkirin, cîhan dîsa bêdeng dimîne. Li Bakurê Kurdistanê her roj Kurd rastî polîtîkayên qirkirinê tên, lê dîsa dinya sê meymûnan dilîze.
Dewleta Tirk evqas cesareta ku hemû rêgezên şer paşguh dike, ji ku tîne? Helbet ev komkujî bi desteka hêzên navneteweyî pêk tên. Di van sed salên dawî de Kurdan bi giranî Lozanê terikandine û hebûna xwe domandine. Kurdên ku li Lozanê jî navên wan hatin qedexekirin, dîsa rabûn ser piyan. Bi taybetî bi Tevgera Azadiya Kurd re ev 50 sal in Kurd ji nû ve zindî bûne. Gelê Kurd îro xwedî hişmendiyeke rêxistinbûyî, siyasî, civakî û rêxistinî ye. Li gel serkeftina Kurdan jî mirov nikare bibêje ku xeteriya ku bi Lozanê destpê kir bi dawî bûye. Ev rastiyek e ku di sedsala nû de pêvajoyeke dijwartir û çalaktir li benda Kurdan e.

FENER



## Çiqas nakok bin, bi hêzên demokrasiyê re li hev nakin

**Idrîs Henan**

Piştî “çongdanîna” bi nav û deng a 2015`an, têkiliya navbera Pûtîn û Erdogan de derbasî qonaxeke nû ya “nîvstratejîk” bû. Çendîn hate hewldan ku weke stratejîk be jî, lê dîroka têkîliyên herdu welatan berovajî wê yekê îfade dikir ku gengeşe û qerebalixa navbera herdu desthilatdariyan de qet neqediyane. Lew re; ji ber hinek hesabên taybet ên herdu aliyan, ku ewantaja kirîza li herêmê qewimiye ye, di berdêla tekûzkirina vê têkiliyê de, hinek pevguherînên cografîk û etnîkî yên qirêj li tevayî Sûriyê û bi taybet li Bakurê Sûriyê rû dan. Ev têkilî bi pêvajoya Astana re bi rêk û pêk bûn û ji radestkirina Helebê heya dagirkirina Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Spî û hewldana lihevanîna Esad û Erdogan were, hemû werzên Astana û encamên vê têkiliya bi guman bûn.
Di wextekê de ku Pûtîn bi xwe û xwarinpêjê xwe ve mijûl bibû, dema ku NATO`yê difikirî çawa li Ukranyayê dorê lê teng bike û têk bibe, mutefîqê wî Erdogan darbeyekê li wê têkiliyê dixe û di nava 72 saetan de gelek kulmên bi êş li Rûsyayê dide ku berpirsê Komisyona Parastin û Ewlehiyê yê Meclisa Yekîtiya Rûsyayê Vîktor Pondarîf ew reftara Tirkiyê weke “kêra li piştê” bi nav kir û got:”Tirkiyê piştî rêzebiryarên provakatîv vediguhere dewleteke ne dostane”.
Diyare bi encamên hilbijartinan û ji nû ve xesibkirina desthilatdariyê re, dema gloverkirina kêşe û dijayetiyan jî qediyaye. Tevî hemû hewldanên mudaxeleya lezgîn, Lîreya Tirkî devberjêriya xwe berneda û êdî dengê zengilê têkçûna desthilatadariyê bilindtir dibû. Metirsiya darbeyekê jî zêde dibû û ti rê li ber Erdoganê faşîst û pêşeroja wî ya siyasî nemabû. Lewre; ji ber şîlobûneke wisa metirsîdar ku desthilatdariya li Tirkiyê tajo lêpirsîna gelêrî û werîsê darvekirinê li dora stûyê Erdogan tengtir dike, ji nû ve xwe davêje hembêza DYA û rojavayiyan. Di serî de serokê Ukranyayê pêşwazî dike û mafê wî yê tevlîbûna NATO`yê erê dike. Tevî lihevkirina bi Rûsyayê re jî, hinek endamên togaya Azofê jî bi Zêlênskî re rê dike. Heman wextê de endamtiya Swêdê ji NATO`yê re erê dike.
Krêmlên vê gavê weke darbe dibîne lê gelek bi sebir li benda encamên pratîkî yên van gotin û helwestên dewletên NATO`yê ye û hinek gavên hatibûn plankirin paş ve avêtin. Axêverê qesra Krêmlênê Dîmîtrî Pîskov di derbarê hevdîtina Pûtîn ya meha bê bi Erdogan re ragihand ku hîna ti dem jê re nehatiye diyarkirin! li ser peymana hinardekirina heb û teneyên Ukranyayê bi rêya Tirkiyê, got ku tiştek nû nîne! Yanê gengaze ku Rûsya wê peymanê nû neke?
Diyare hemû hewlên Rûsya yên “Hesipkirina” Erdogan û “Troykirina” NATO`yê badilhewa çûne û têgihaşt ku çi bendewariyên li ser pişta Erdogan dabûn avakirin pêk nayên. Ew xeteriyên wê yekê baş dizane û difikire ku rê nede reftarên Tirkiyê ji bo NATO`yê veguherin destkeftiyên siyasî.
Çendîn di vê derbarê de hatibe gotin û çi daxuyaniya aliyan jî hebin, lê tişta balkêş ew e ku; tevî tengezariya hêzên destwerdanê û rewşa dijatiya navxweyî, lê dîsa jî ji ber xisûsa desthilatdar a dewletdariyê, ji bo çareseriyê, gotir nakin bi hêzên demokrasiyê re li hev bikin. Berovajî wê; hewl didin hesabên xwe bi çewsandina gel re safî bikin.
Ev hişmendiya di dewrê de, diyar dike ku herêm ber terazûyeke nû ya hêzê ve diçe, itîfaqên parçeyî li Sûriyê êdî bi dawî dibin û çareserî li benda teqîneke şoreşwar e ku nexşeyên ceosiyasî bi xwe re biguherîne.